kurdî li Sûriyê bê avakirin, hemî hêz û rêxistinên kurdî û kesayetiyên xweser cihên xwe têde bigrin?

B- *Têkiliyên di navbera **ENÎ** û **HEVBENDÎ** yê de, divê pêşkevin. Yê me wek partî tu problem li ba me nînin. Em dixwazin ku ev dîtina hevbeş bibe ya Tevgera Kurd bi tevayî. Nêzîk, rûniştinek heye ji bo pêkanîna encumenek Kurdî li Sûriyê. Gerek rêxistinên Ttevgera Kurd hemî têde cih bigrin, hêviya me ew e.*

5- Wek hatiye naskirin dan û standin di navbera we û P-Y-D-K-S de hene ,û win bi karine hevbeş radibin , ta bi çi radeyê ye pêşketina vê yekê?

B- *Ev biryar di navbera herdû partiyan de istiratîcî û gelekî li pêş e, em bi hêvî ne bigihe qûnaxa yekîtiyê. Hêviyên min li ser vê gelekî hene ku pêşkeve. Ji ber nêrînên me nêzîkî hev in, em xwe dibînin wek partiyek, em bi hêvî ne ku fireh bibe bi rengekî nû û li ser bingehek demokrat. Bêyî vê , wê zehmet be tuştek pêşkeve.*

6- Piştî rûniştina ENÎ û HEVBEDÎ yê bi cîgira serok komarê sûriyê re, ji bo vegerandina nasnamê li Kurdên ku, di 1962 an de hatibûn kişandin, ta bi çi radeyê hêvî li ser têne girêdan?

B- *Bê goman piştî hatina serok Beşar Elesed, hêvî li ser pêşvebirin û nûbûnê hatin girêdan. Lê mixabin ta nuha ew sîstema kevin hê dişopîne, em tu hêviyan li ser girênadin. Lê ev dîtin, em wê pozitîv(erênî) dinirxînin. Ew jî hatiye ji hilguvaştina ku, li ser rijêmê tê meşandin, gerek dîtin bi tevgera kurdî re be. Ya dîtir, gerek em hay ji hevdû hebin, em bi hevre herin yan bi hevre neçin. Ewan da xuyakirin ku, ev nasname wê rewşa wê bê çareserkirin. Berê jî soz hatibûn dan,em hêvîdarin vê carê rast be.*

7- Di warê geşkirina wêje, çand,folklor,û zimanê kurdî de , partiya we çi karî îro dike

B- *Li ba me kovarek bi navê **(JÎN)** heye , bi kurdî û erebî ye, jimara wê gihaye 101 ê, **ROJ** û **AZADÎ** jî du kovar in heremî ne, yek li Cezîrê, ya din li HELEBÊ derdikeve. Komîtên fêrbûna zimên hene, em dibînin gerek ji wilo kar bihtir b. Lê rewşa zimên li ba hevalên YEKÎTÎ baş li pêş e û guhdan lê baş dibe.*

8- Eve 67 hejmar ji weşana NEWROZ a du mehane bi temenê /10/ salan belav bûne . Hûn derçûna vê belavokê çawa dibînin, çi rexne û kêmasiyan lê digrin mamoste ?

B-*wek di pêşde min got bi rastî NEWROZ stêrek geş e bi gelek tuştan ve mijûl dibe, berdewamiyê ez jêre dixwazim , bi hêvî me roj bi roj pêşkeve .*

9- Bê gomane ku zimanê me nasnama me ya netewî ye, ji bo fêrbûn û fêrkirina zimanê dayika me, hûn ji keç û lawên gelê xwe re çi dibêjin ?

B- *ez bi hêvî me keç , law û hemû kesên Kurd taybetmendiyekê bidin zimên. Ji ber ew nasnama me ye . Tevgera Kurdî di vî warî de tuştin baş kirine .*

10- Gotina te ya dawî ji xwendevanên NEWROZ re çiye mamoste ?

B- *silavên min li ser rûpelê NEWROZ ê ji hemî karmend û xwendevanên wê re rêdikim, NEWROZÊ bixwênin û bidin xwendin.*

Ji kûrbûna dilê xwe , mamoste em we sipas dikin